


MIZGÎN

1 - Berfanbar - 2025



Naverok

- 1 Wênesazî
- 2 Wêjeya Zarokan
- 3 Lîsk
- 4 Welatê me
- 5 Tu dizanî
- 6 Tendirustî
- 7 Tîp û gotin
- 8 Navdar
- 9 Bexçeyê Navan
- 10 Jîngeh mala me ye
- 11 Jêhatiyên Zarokan
- 12 çîrok
- 16 Bixwînin û fêr bibin
- 17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros
Rojhilat

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

 Kovara Mazgîn

 Kovara Mazgîn مجلة مزكین

**Werzê payîzê wekî
wêneyê reng bike**

لَوْنِ فَصْلِ الخَرِيفِ كَمَا فِي الرَّسْمِ المُرْفِقِ.





Zimanê me

*Zimanê me şêrîn e
Wek demsalan rengîne
Carê tîpên kesk û sor
Û carê çem û kanî ne*

*Ev xwendin ronahî ye
Zanistek tim zindî ye
Ji jêrê ve ber bi jor
Wek simbila avî ye*


*Mala min bû dibistan
Bera xweş be ev jiyân
Xweşik bikin hawîrdor
Azad dibe Kurdistan*

*Navan bêjin bi kurdî
Jinava buhara zindî
Tenûr û nanê kulor
Ez im Fîxanê gundî*

Fîxan Hîmo

Ji bo temamkirina wêneyê
rêza hejmaran bişopîne.

اتبع تسلسل الأرقام لتكتمل الرسم



Bajarê Mêrdînê

مدينة ماردين

Ew li Bakurê Kurdistanê, li ser rêzeçiyayan û deşta Cezîrê ye. Piraniya xaniyên wê ji keviran hatine çêkirin û ew bajarekî tiji çîrok e. Gelek gel ji wir derbas bûne: Kurd, Suryan, Ermen, Ereb û Tirkmen, her yek ji van gelan şopa xwe li bazar, dêr û mizgeftan hiştiye.

Li Mêrdînê gelek cihên kevneşopî û xaniyên kevinar hene, di nav wan de: Xaniyên kevirî: Xwedî pêşrûyên xemilandî û pencereyên piçûk ên xweşik in.

Keleha Kevin: Li ser çiyayekî ye û bi sedan salan e bajar diparêze.

Dêr: Dêra Zeferanê ya navdar.

Bazarên teng: Bêhna qehweya hûrkirî û biharatan jê difûre.

تقع في باکور کُردستانَ على سلسلِةِ جبال، وتُشرفُ على سهول الجزيرة. مُعظمُ بيوتها مبنية من الحجارِة، وهي مدينة مليئة بالحكايات، مرت عليها شعوب كثيرة: الكرد، السريان، الأرمن، العرب، والترکمان، وكل شعب من هذه الشعوب ترك أثره في الأسواق، والكنائس، والمساجد، والأديرة. تكثر في ماردين معالم أثرية، وبيوت قديمة منها:

البيوت الحجرية: بواجهات مزينة، ونوافذ صغيرة جميلة.

القلعة القديمة: تقع على قمة الجبل، تحرس المدينة منذ مئات السنين.

الأديرة والكنائس: دير الزعفران الشهير. الأسواق الضيقة: حيث تفوح رائحة القهوة المطحونة، والتوابل.




معلومات عن الحيوانات

Tu dizanî?

Deve: Ji ber ku ew dikare demek dirêj tîbûnê tehemûl bike, jê re keştiya çolistanê tê gotin.

الجمال: يُلقب بسفينة الصحراء؛ لأنه يتحمل العطش طويلاً.



Dulfîn: Lawirke deryayî ye ku ji lîstinê hez dike.

الدلفين: حيوان بحريّ ويحبّ اللّعب.

هل تعلم؟



Pengwîn: Ew di komên mezin de yên bi navê mitîngehan li Çemsera Başûr dijîn.

البطريق: يعيش في جماعات كبيرة، تُسمّى المُستعمرات في القطب الجنوبيّ.

Kund: Ew tiştan di tariyê de dibîne û jê re dibêjin aqlmendê firindeyan.

البومة: ترى الأشياء في الظلام، وتلقب بحكيمة الطيور.



Paqijiya destan

Hevalno, şuştina destên we mer-talek parastinê ye li dijî mîkroban. Ji ber ku mîkrob dijminên nedîtî ne ku êrîşî laş dikin, şuştina destên we bi sabûn û avê tekan e rêya têkbirina mîkroban e berî ku zirarê bidin laşê we.

Strana xwe ya ku tu jê hez dikî hilbijêre, destên xwe bişo û bi dengê bilind stranê bêje. Tiliyên xwe ji hev dûrbixe û binê neynûkên xwe paqij bike, ji ber ku ew der cihê ku mîkrob xwe lê vedişêrin. Piştî şuştinê, destên xwe baş zuha bike.



نظافة اليدين

يا أصدقاء، غَسِّلْ يَدَيْكَ، الدَّرْعُ الْوَاقِي
ضَدَّ الْجَرَائِمِ. لَأَنَّ الْجَرَائِمَ أَعْدَاءُ غَيْرِ
مَرْتَبِينَ، تَهَاجِمُ الْجِسْمَ، فِغْسَلِ
الْيَدَيْنِ بِالْمَاءِ وَالصَّابُونِ الطَّرِيقَةَ
الْوَحِيدَةَ لِلْقَضَاءِ عَلَيْهَا، قَبْلَ أَنْ
تَتِمَّكَنَ مِنَ الْإِحْاطِ الضَّررِ بِالْجِسْمِ.
اخْتَرِ أَعْيُنِيكَ الْمَفْضَلَةَ، وَاغْسَلِ
يَدَيْكَ، وَأَنْتَ تُؤَدِّيهِ بِصَوْتِ عَالٍ.
بَاهْتِمَامٍ كَبِيرٍ، وَخَلِّ بَيْنَ الْأَصَابِعِ،
وَنظْفِ مَا تَحْتَ الْأَظْفَارِ جَيِّدًا، فَهِيَ
مَخْبَأُ الْجَرَائِمِ، وَبَعْدَ الْأَنْتِهَاءِ مِنْ
الْغَسْلِ نَشْفِ يَدَيْكَ جَيِّدًا.



Van peyvên li jêr di xişteyê de bibîne û xêzkekê li wan bide.

Reng Tablo Hejmar Rûpel Jêbir Pênûs
Mamoste Xêz Boyax

H	e	j	m	a	r	D
M	a	m	o	s	t	e
R	e	n	g	A	J	R
B	o	y	a	x	ê	û
P	ê	n	û	s	b	p
T	a	b	l	o	i	e
	R	X	ê	z	r	l

Peyva wenda metelokek e ku dibêje:


Ez di biharê de kesk im. **الكلمة المفقودة جزرة تقول:**

Û di havînê de fêkî didim.

Di payîzê de pelên min difirin.

Û di zivistanê de ez dîsa zêde dibim.

Ez kî me?



أنا خضراء في الربيع.
وأعطي الفواكه في الصيف.
وفي الخريف أوراقني تطير.
وفي الشتاء من جديد أتكاثر.
فمن أكون يا صغيري؟

Helbestvan Leyla Reşo di sala 1979'an de li bajarê Heseke ji dayik bûye. Leyla ji xwendinê pir hez dikir, lê şert û mercên dijwar nehiştin ku ew xwendina xwe li Fakulteya Perwerdehiyê biqedîne. Lê, xeyalên wê qet nesekinîn! Îro ew li dibistanên navîn ên Rêveberiya Xweser mamosteya wêje û rêzimanê Kurdî ye. Bi salan e ku Leyla bi hestên xwe li ser xweza, welat, xurbet, jin û civakê helbestan dinivîse.



Helbestvan

Leyla Reşo

الشَّاعِرَةُ

ليلى رشو

Ji berhemên wê yên wêjeyî yên çapkirî:

Tava Hêviyan

Lale û peyal

Xeyalên reswa

Înana

Helbestvan Leyla bi berhemên

girîng tevî

kovara Mizgîn bûye,

ew bi taybetî ji bo zarokan

helbestan

dinivîse.

Ew her car ji wan re dibêje:

"Ez pir kêfxweş dibim dema ku ez

gotinên xwe ji

dilên we yên biçûk re dişînim, ji ber

ku hûn, hevalên min ên biçûk,

bextewarî û şahiya cîhanê ne."

وُلِدَتِ الشَّاعِرَةُ لَيْلَى رَشُو فِي مَدِينَةِ الْحَسَكَةِ عَامَ 1979. تَحَبُّ لَيْلَى الدِّرَاسَةَ كَثِيرًا، لَكِنْ الطَّرِيفُ الصَّعْبُ مَنَعَهَا مِنْ إِكْمَالِ تَعْلِيمِهَا فِي كَلِيَّةِ التَّرْبِيَةِ. وَمَعَ ذَلِكَ، لَمْ تَتَوَقَّفْ أَحْلَامُهَا أَبَدًا! فَهِيَ الْيَوْمَ مَدْرِيسَةٌ لِلدَّبِّ الْكُرْدِيِّ، وَقَوَاعِدِ اللُّغَةِ فِي الثَّانَوِيَّاتِ التَّابِعَةِ لِلدِّارَةِ الذَّاتِيَّةِ. مِنْذُ سِنَوَاتٍ طَوِيلَةٍ، تَكْتُبُ لَيْلَى الشَّعْرَ بِإِحْسَاسٍ، عَنِ الطَّبِيعَةِ وَالْوَطَنِ وَالْغَرِيبَةِ وَالْمَرَأَةِ وَالْمَجْتَمَعِ. وَمِنْ أَعْمَالِهَا الشَّعْرِيَّةِ الَّتِي أُصْدِرَتْهَا:

Tava hêviyan

Lale û peyal

Xeyalên reswa

Înana

وللشَّاعِرَةِ لَيْلَى مُشَارَكَاتٌ مُمَيَّزَةٌ فِي

مجلة مزكين، حيث تكتب قصائد

مخصصة للأطفال

وهي تقول دائمًا لهم:

"أشعرُ بسعادةٍ كبيرةٍ حينَ أوجَّهُ

كلماتي إلى قلوبكم الصَّغيرة،

فأنتم يا أصدقائي الصَّغارَ سعادةُ

الدُّنيا وبهجتها."

Hin Navên bi tîpa -A

Avjîn

Awaz

Aldar

Avdar

Ahîn


Alîn

Arî

Arîn

Aram


الهواء يتضايق!



Rojekê, Mizgîn dengekî hêdî bihîst: "Ez hewa me... Ez hevalê we me, bi dûmanê min tengav nekin!"

في أحد الأيام، سمعت مزكين صوتًا خافتًا: "أنا الهواء... أنا صديقكم، لا تضايقوني بالدخان!"

Mizgîn li dora xwe nerî: Otomobil dûmanê derdixin, çop dihat şewitandin û cîranan jî sobe li hewşê bi kar dianîn! Hevalno, hewayê paqij ji bo tenduristî û laşê me baş e, ji bo lîstin û xwendinê jî enerjiya domdar dide me, lê ew jî me hêrs bûye ji ber ku mirov wê qirêj dikin û zirarê didin wê.



Werin em alîkariya wê bikin ku dişa tenduristiya wê baş bibe.

Em şînatîyekê biçînin, ji malbatên xwe daxawaz bikin ku eger pêwîstiya wan bi otombîlê nebe, motorên wê vemirînin, herwiha em bi mezinan re çopê kom bikin û wê neşewitînin.

Her ku dar zêdetir bibin, hewa paqijtir dibe, xweza xweşîktir dibe û tenduristiya me ewletir dibe.

مزكين نظرث حولها: سيارات تطلق دخانًا، ونفايات تحرق، وهناك الجيران يستخدمون الموقد في باحة المنزل!

يا أصدقاء الهواء النظيف، مفيد لصحتنا وأجسامنا، ويعطينا النشاط الدائم للعب والدراسة، لكنه غائب منا؛ لأن البشر يلوثونه ويضرّونه. دعونا نساعد؛ كي تعود إليه صحته.

فزرع نبتة، ونطلب من أهلنا إطفاء محركات السيارات، لحين الحاجة إليها، وتعاون مع الكبار في جمع القمامة، وألا تحرقها. وكلما ازادت الأشجار، أصبح الهواء نظيفًا، وتجملت الطبيعة وصحتنا تصبح أمنة.



Hevalên min ên biçûk, ez hevala we Mizgîn im,
ez vê pirsê ji we dikim:

أصدقائي الصغار، أنا صديقتكم مزكين،
أطرح عليكم السؤال التالي:

**Tu çawa bajarekî xweşik yê taybet bi
xwe ava bikî?**

كيف تبني مدينة جميلة خاصة بك؟

Hevala me **Dêrîn Ramî Misewer**
bersiv da:

صديقتنا **ديرين رامي مسور**
أجابت:

"Ez dixwazim bajarê min xweşik be û
navendên muzîk û wênesaziyê tê de hebin, da
ku ez bikaribim bilîzim û wêneyan xêz bikim!"

"أرغب أن تكون مدينتي جميلة، فيها صالة
للموسيقا والرسم، لأعزف وأرسم كيفما أشاء!"

Hevalê me Can **Hogir Şêx Mûsa**
wiha bersiv da:

أما صديقنا جان **هوكر شيخ**
موسى فأجاب:

"Ez dixwazim bajarê min fireh be, bexçeyên
xweşik û cihên lîstina bisîkletan lê hebe!"

"أتمنى أن تكون مدينتي واسعة، فيها حدائق
جميلة، وأماكن مخصصة للعب بالدراجات
الحوائية!"




Çiroka : Hevalên Deryayê

Xeyal bike Arîn, eger em bizanin çi di bin pêlan de ye.

Bê guman ew cîhaneke nediyar e û tîjî surprayzin.



Waw...Erê




Silav hevalno! Ez kîsoya deryayê me...Hûn rêwîtiyeke efsûnî di deryayê de dixwazin?

Binêre Sîrwan, masî wekî stêrkan dibiqin.

Ji wekî ku min hêvî dikir, xweşîktir e!







Binêre Sîrwan,
masî wekî stêrkan
dibrqîn.

Ji wekî ku min
hêvî dikir,
xweşiktir e!

Silav! Ez masiya
tenazîbaz im. Werin
ez ê cihê herî xweşik ê
deryayê nîşanî we
bidim!



Ew çiqas xweşik
e, hûn çî sûtê ji
mercanan digrin.




Mercan mala
masiyan e, ew
elîkariya me tevan
di bêhîndanê de
dike.



Binêre, ew wek fişekên hewayî bi hev re diçin û tèn.

Ew tabloyeke zindî ye!



Ew ê me bixwe!

Ohhh! Semasiyekî girs!

Zû bike, Sîrwan... Tûrikê plastîk wê dixeniqîne!



Netirs in! Ez ne xeternak im... Tiştê herî xeternak bermahiyên mirovan in ku me dikujin.

Rastî?!



Wa rizgar bû!

Spas...We jiyana min rizgar kir!



Divê em ji mirovan re bêjin ku çopê neavêjin deryayê.


Belê, derya bi hewceya hevalên dilsoz e.



Li pey min werin... ber bi Şikefta nepeniyên ve!



Waw! Ew weki stêrkan dibiriqê!



Ev lûlûyeke (mirarî) efsûnî ye...
Tine bîra we ku derya heval e û divê bê parastin.

Ezê herdem wê biparêzim



Rêwîtiyeke ku nayê jibîrkirin...
Derya ji xeyalan jî xweştir e

Ji ber wê divê em parastina deryayê bikin û çopê navêjin nava wê



Ev mirarî (lûlû) dê her tim hevaltiya me bi deryayê re bîne bîra me

Û em ê çîroka wê di nava civakê de belav bikin.

Çavika Mizgîn

عدسة مزكين



مركز

1 - كانون الأول - 2025

